

Beşdar be...Tê bizanibe

Weke hercarê, dema ku wextê şanogeriya hilbijartinên wêneyî(sexte) yên Sûriyê nêzîk dibe, deng bilind dibin û nêrîn û helwêstên partiyên kurdî dikevin pêşbirkê de.Alîgirên beşdarîkirinê di hilbijartinan de, li benda"xêrek"êji serokomar dimînin-weke ku di serdema Hafiz Esed de pêkdihat-dema ku hinek kes ên ku biriyar bi tevahî bicî tanîn tanî di şêweya rûniştin û danûsitendina bi dostan re û ezberkirina pesindan û naznavên serokayetiyê- di parlementoyê de dihatin te`în kirin.Pirsgirêka van alîgirên kilasîk ewe ku şansê wan nîn bû ji ber gelek sedeman weke derketina alîgirin dinê ku di nava xwe de hesreta ketina parlementoya rêjîmê ji mêj ve vedişêrin, yên ku heye bibine pêşbirikên wan di warê pêşkêşkirina xizmetan bi taybetî rawestandina kolana kurdî û aramkirina wê û dûrkirina"tundrewan"!!ji wê.

Bandora pilanên rêjîmê van rojan di gorepana kurdî de diyar e, bi taybetî ser girûpên partiyên me, yên ku weke zîbeqê bi şev beşdar in û bi roj ne başdar in, bêyî ti guhdana balkêş ji aliyê cemawer û welatparêzên kurd ve.Ev jî nîşaneke din e ku hilbijartinên ku dê di dawiya vê mehê de–Nîsanê-pêkwerin ne ciyê baldariya welatiyên kurd e nejî welatiyên Sûriyê bi giştî-ji xwedî ezmûn bipirse ne ji hekîman!-

Van rojan em note û awazeke nû dibihîzin ji hinek kesên ku ji rastiya pirsgirêka kurdî tênagihin, û li dirêjahiya jiyana xwe ya siyasî têkçûyî û binkeftî bûne, ku dixwazin navdar bibin .Bi rengekî nedîrekt, bang û awazên wan dikevin xizmeta berjewendiyên

desthilatdariyê de, bi taybetî cidakirina tevgera siyasiya kurdî ji tevgera opozisyona dêmokiratîka Sûrî bi hincet û behaneyên ne reel û çewit dema ew dibêjin ku pirsgirêka kurdî dikare çareser bibe bêyî bicî anîna rêjîmeke dêmokiratîk, û bazarê bi rêjîmê re ji pişt opozisyona Sûrî ve ya ku nikare desthilatdariyê bidest bixe li gor wan, dikin.

Ecêb e ku hinek kes rastiyan bi vî rengî tevlîhev dikin:Çawa beşdarîkirin di bangewaziyên rêjîma ku ji xwe venasînê bi hebûn û doza milletê kurd nade dibe?!.Çawa beşdarîkirin di hilbijartinên ku di bin saya yasayên `urfî û û awarte û desthilatdariya partiya serdest–ya ku serokatiya dewlet û civakê dike-û tunebûna yasayeke hilbijartinan ya dêmokiratîk û modêrin û yasayeke ku karûbarên partiyan û ragihandin, medyayê birêve bibe, dibe?Ji vê wêdetir, gelo çi sûdeya beşdarîbûna girûpên kurdî di hilbijartinan de, di vê atmosfêra parçebûna partiyan-jimare wan aniha 24 girûp e–û parçebûna mezin di tevahiya tevgera neteweyî kurdî û maytêkirin, desttêwerdana alavên ewlekariyê di laşê wê de, heye?.